# ÇALAKIYÊN KOBANÊ YÊN LI TIRKIYÊ

## BINPÊKIRINÊN MAFÊN MIROVAN

AMNESTY INTERNATIONAL

Çapemeniya Yekemîn 2015

Amnesty International Ltd
Peter Benenson House
1 Easton Street
London WC1X 0DW
United Kingdom

© Rêxistina Efûya Navnetewî 2015

Index: EUR 44/2017/2015
Zimanê orjînal: Îngilîzî
Çapkirin: Rexistina Efûya Navnetewî,
Sekreterîya Navnetewî, Brîtanya

Mafên giştî parastî ne. Ev weşan bi telîf e, bes dibe bê çapkirin bê heqê şêwirmendî ji bo alîkarî, qampanya û armanca perwerde, bes ne ji bo nûve firotin.

Xwedîyê telîfê daxwaza qeydkirina digel wan ya van tişta dike, ji bo armanca nirxandina bandor.

Ji bo qopyakirin, di wezîyetên din de yan ji bo nûve bikaranîn di wêşanên din de, yan ji bo wergerîyan adaptasyon, berê dibê destûra niviskî ji weşanger bê standin û divê heq bên dayîn.
Ji bo daxwaza destûrê yan jî daxwazek din, ji kerema xwe serî li copyright@amnesty.org bidin.

Rêxistina Efûya Navnetewî tevgerek cîhanî ye; tevî zêdeyî 3 milyon alîgir, endamû çalakîkeran, li zêdeyî 150 welat û herêman de hewldidin ji bo dawîkirina bedkarîyên cidî yên mafên mirovan.

Vîzyona me ew e kû her kes ji hemû mafên ku Deklarasyona Cîhanî ya Mafên Mirovan de tên parastin û ji standardên din yên mafên mirovan yên navnetewî fêdebike.

Em ji hikûmetan, ideolojîyên sîyasî, fêdeyên aborî yan jî olî azade ne û mesrefa me ji alî endamên me û bexşên gel tên dayîn.

AMNESTY INTERNATIONAL

# NAVEROK


NAVEROK 3

1. DESTPÊK 5

2. KÊMASIYA PARASTINA TAKEKESAN 7

3. BIKARANÎNA POLÎS A HÊZ Û ÇEKAN 10

4. LÊPIRSÎNA MIRIN Û BIRÎNDARIYAN 14

5. ENCAM Û PÊŞNIYAR 17

  ENCAM 17

  PÊŞNIYARÊN JI RAYEDARÊN TIRK RE 17

    KONTROLKIRINA XWEPÊŞANDANAN 17

    BIKARANÎNA HÊZ Û ÇEKAN 18

    BERPIRSIYARÎ 18

# 1. DESTPÊK

Cotmeha 2014'an, li başûrê rojhilatê Tirkiyê ku piranî Kurd in, xwepêşandan pêk hatin li dijî pêşdeçûna komeke çekdar, ku xwe wek Dewleta Îslamê (DÎ) bi nav dike, ya ber bi bajarê Kurdan Kobanê/Ayn Al-Arab yê li ser sînorê Suriyê û Tirkiyê, û wê demê jî bajar bin kontrola Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bû ku komeke çekdar a ku xwedî girêdanên bi Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ye. Nêzikî 200,000 penaberên Kurdên li Suriyê ji sînor derbasî nav Tirkiyê bûn.[1] Çalakgeran DÎ û hin kesên li Tirkiyê û endamên hikumetê protesto kirin, her ku ew bi hevkariya wan sûcdar dikirin, û ew wek tawanbarê alîkariya ji bo pêşdeçûna DÎ didîtin. Li encama protestoyên yek hefteyê û tundiya berfireh a bi pê re, 40'î zêdetir kes mirin ku tê de çalakgerên Kobanê, dijberên polîtîk ên ku bi piştgiriya DÎ dihatin sûcdarkirin, kesên ku di rê de derbas dibûn, û polîs hebûn.[2] Pevçûnan di heman demê de bi xwe re gelek birîndarî jî çêkirin, û li başûrê rojhilatê Tirkiyê ku piranî Kurd in û li deverên din bûn bayîsê rûxandina milkên şexsî û gelemperî.

Protestoyên berbelav, ên ku piranî wek pevçûnên tund ên navbera komên polîtîk û/an jî polîsan bûn, 6'ê Cotmeha 2014'an dest pê kir, dema ku Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ku partiyeke çepgir a Kurdan e, û Koma Civakên Kurdistan'ê (KCK) ku rêxistineke sîvane ya qedexe û nêzikî PKK'ê ye, bang li alîgirên xwe kirin da ku derkevin kolanan.[3] Pevçûn piranî navbera alîgirên parastina YPG'ê ya Kobanê û alîgirên dijberên wan ên muhafazakarên oldar Hüda Par'ê (Partiya Doza Azad) qewimîn, ku ew partî bi piştgiriya DÎ dihat tawanbarkirin, lê ji hêla Hüda Par'ê bi xwe ve dihat înkarkirin. Qeyrana Kobanê neyartiya navbera wan hêzên siyasî ya ku kel bûbû hêj bêtir gurr kir, û fikarên vegera salên 1990'an derxist pêş ku wê demê kuştin û tolhildan navbera kesên çêkdar ên girêdayî wan koman çêbûbûn. Di sala 2015'an jî kuştin çêbûn, lê dîsa jî ne di asta yên Cotmeha 2014'an de bûn.[4]

Li bajarê Amed'ê yê li başûrê rojhilat di pevçûnên navbera komên çalakgerê Kobanê û Hüda Par'ê de 11 kes mirin, ku tê de hem alîgirên wan her du koman û hem jî welatiyên netêkildar hebûn. 5 kes li bajarê Dîlok'ê yê li başûr mirin, ku li wê bajarê çalakgerên Kobanê bi polîs û

---

[1] Rêxistina Efûya Navnetewî, Têkoşîna Ji Bo Jiyanê: Penaberên Suriyeyî Yên Li Tirkiyê, EUR/44/017/2014, Mijdar 2014, Rûpel 10-11. Di https://www.amnesty.org/download/Documents/208000/eur440172014en.pdf de berdest e.

[2] Komeleya Mafê Mirovan a Tirkiyê, Rapora Binpêkirinên Mafan ku Encama Mudaxileya bi Kiryar û Çalakiyên di Çarçobeya Piştevaniya Berxwedana Kobaniyê de Pêk Hatin (2-12 Cotmeh 2014), Cotmeh 2015. Di http://www.ihd.org.tr/kobane-direnisi-ile-dayanisma-kapsaminda-yapilan-eylem-ve-etkinliklere-mudahale-sonucu-meydana-gelen-hak-ihlalleri-raporu-2-12-ekim-2014/de berdest e.

[3] Al Monitor, Tundiya aktîvîstên Kurd arîşeya Kobaniyê dixe nav kolanên Tirkiyê, 8 Cotmeh 2014. Di http://www.al-monitor.com/pulse/originals/2014/10/turkey-syria-kurds-Kobanê-pkk-street-violence.html# de berdest e.

[4] Radikal, Li Amed'ê Serokê Yeni İhya Der'ê Aytaç Baran hat kuştin, 9 Pûşper 2015. Di http://www.radikal.com.tr/turkiye/diyarbakirda_ihya_der_baskani_aytac_baran_olduruldu-1375925 de berdest e.

neteweperestên Tirk re ketin nav pevçûnê. 5 kes li Sêrt'ê mirin, her ku pevçûn navbera çalakger û polîsan û hin sivîlên çekdar pêk hatin. Kuştinên dîtir li bajarên başûrê rojhilat û rojhilat ên wek Êlih, Çewlik, Mêrdîn, Mûş û Wan'ê, li bajarê Edene yê li başûrê Tirkiyê û li bajarên rojava yên wek Stenbol û Izmîr'ê qewimîn.[5] Di gel ku pevçûn piranî di Cotmeha 2014'an de bi dawî bûbûn jî, li navçeya Cizîr'ê ya bajarê Şirnex'ê bûyeran domand, û di dawiya meha Berfanbarê de hêj zêdetir bûn û encama wan bûyeran li mehên Berfanbara 2014'an û Rêbendana 2015'an şeş kuştî çêbûn.

Ev rapor kêmasiya rayedaran a di bergiriyên kuştin û birîndarbûnan de ku dema pevçûnên navbera komên dijber çêbûn, bikaranîna hêza zêdeyî ya ji hêla polîsan ku bû bayîsê kuştin û birîndarbûnan û kêmasiya hiqûqî ya ku nekarî ji qurbaniyan re edalet û tezmînatê dabîn bike, dest nîşan dike.

Rapor li ser esasê lêkolînên li bajarên Amed, Dîlok û Sêrt'ê yên Cotmeha 2014'an û lêkolînên li Amed, Şirnex û Sêrt'ê yên Reşemiya 2015'an, û bi rêya hevpeyvînên li gel takekesên ku wê demê li wan herêman dijiyan hat amadekirin. Delegasyona Rêxistina Efûya Navnetewî bi birîndarên wan pevçûnan re, bi xizmên kesên jiyana xwe windakirî re, bi parêzer, aktîvîst, û saziyên mafê mirovan re, bi komên polîtîk, şaredar û nûnerên lokal ên Wezareta Karên Hundirîn re hat cem hev. Rapor bi tenê agahiyên bêzarkêr ên pevçûnên li herêmê û lêpirsînên wan bûyeran nade, her wiha mînakên temsîldar ji wan çar bajaran dibijêre da ku pêşniyaran ji rayedaran re dabîn bike û ew jî di pêşerojê de pêşî li sûcên dîtir bigirin.

---

[5] Komeleya Mafê Mirovan a Tirkiyê, Rapora Binpêkirinên Mafan ku Encama Mudaxileya bi Kiryar û Çalakiyên di Çarçobeya Piştevaniya Berxwedana Kobaniyê de Pêk Hatin (2-12 Cotmeh 2014), Cotmeh 2015. Di http://www.ihd.org.tr/kobane-direnisi-ile-dayanisma-kapsaminda-yapilan-eylem-ve-etkinliklere-mudahale-sonucu-meydana-gelen-hak-ihlalleri-raporu-2-12-ekim-2014/de berdest e.

# 2. KÊMASIYA PARASTINA TAKEKESAN

Kêmasiya dewletê ya parastina takekesan dikare bê wateya binpêkirina mafê jiyanê. Binbariyên Tirkiyê yên mafên mirovan ên navnetewî ku derbarê parastina mafê jiyanê ye, ji parastina kuştina bizanetî û bêdadî wêdetir diçe heya parastina jiyana takekesan a ji kesên sêyem fireh dibe.[6] Rêxistina Efûya Navnetewîderbarê kêmasiya polîsan a di têkilbûna rêkûpêk a dema bûyeran de xwedî fikar e ku divê bi peywendiya protestoyê û ji bo parastina jiyan û tenduristiya çalakger û welatiyên peya derbas dibin pêk were. Gelek hevpeyvînberan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku polîsan qet hewl neda ku bikevin navbera pevçûnên navbera komên polîtîk ku di encamê de çalakger dij-çalakger û rêwî hatin kuştin.[7] Her wisa hat gotin ku di çend bûyeran de di gel ku polîs derbarê kesên êrîş didan şexsan û avahiyan hatibûn agahdarkirin jî, wan xwe têkil nekiriye an jî neçûne cihê bûyeran.[8] Hevpeyvînberan dîsa ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku dema ku çalakger rastî êrîşa dij-çalakger an jî kesên sivîl hatin polîs di têkilbûnê de kêmas ma.[9]Rayedaran ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku di hin bûyeran de ji ber kapasîteya xwe an jî ji ber fikara bilindkirina bûyeran ew têkilî bûyeran nebûne. Li Cizîrê, wek mînak, rayedaran digot ku ji ber xendekên ku çalakgeran kolayî nekarîne bikevin hin taxan.

7'ê Cotmehê li Baxlar'a Amed'ê, ew cihê ku pêvçûnên xirabtirîn ên li bajêr qewimîn, 6 mêran di encama birîndariyên di pevçûnên navbera komên dijber de yên nêzikî avahiya komeleya Köy-Der'ê ku têkildarî Hüda Par'ê jiyana xwe dest da. Zarokek, **Yasin Börü** (16), û sê ciwan, **Ahmet Dakak** (19), **Riyad Güneş** (26) and **Hasan Gökguz** (25), piştî ku ketin avahiyê ku ji êrîşkeran direvîn hatin kuştin.Raporên otopsiyê dest nîşan dikin ku ew hatibûn kêrkirin û gule berdabûn wan. Şahidan ragihand ku termê wan ji qata sêyan avêtin jêr û du term hatin şewitandin û di ser laşekê jî erebeyek bi zanebûn derbas bû. Rayedarên Hüda Par'ê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku wan çendîn caran di nav 30 deqeyên ku ew li avahiyê bûne telefonî polîsan kiriye, derbarê rewşê hişyarî dane wan lê ew 45 deqe piştî mayîna laşan a li erdê hatine, ku ji bo gihîştina ciheke wiha navendî demeke pir zêde ye.

Rayedarên Hüda Par'ê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re qala bûyereke din kirin ku tê de komeleyeke din a têkildarî Hüda Par'ê, bi navê Cami-Der, rastî êrîşa çalakvanên Kobanê hat. Wan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku daxwaza wan a alîkariyê ya ji polîsan bi hinceta "ji bo mayîna hundirê qereqola polîsan ferman wergirtine" hat redkirin (ku dûratiya wan a

---

[6] Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa'yê dest nîşan dike ku Made 2"Mafê jiyanê" ji Dewletan re pêwîst dibîne ku qanûnên kartêker ên dijî sûc dabîn bikin û wan bi dezgeheke pêkanîna qanûnê xurt bikin (Osman v United Kingdom,jimareya serlêdanê. 23452/94, biryara 28 Cotmeh 1998). Dadgeh dîsa dest nîşan kiriye ku dewlet ê berpirsiyar be" eger ku haya rayedaran bi rîskeke rasteqîn û teqez a ji kesên sêyem a derbarê xetereya jiyana takekesekî an jî takekesan çêbûbe û wan ji bo defdana wê rîskê tişta ku ji destên wan tên nekiribe" (xala.116)

[7] Hevpeyvînên li Cizîr, Amed'ê

[8] Hevpeyvînên li Cizîr, Amed'ê

[9] Hevpeyvînên Dîlok, Sêrt, Sêrt Misirc'ê

cihê bûyerê ji 500 mîtroyê kêmtir bû). Avahiya Cami-Der'ê hat sotin û yekser şewitî, her çiqas di êrîşê de çi kes birîndar nebû.

**Abdullah Deniz** (65), bavê rayedarekî Hüda Par'ê yê niştecihî, 27'ê Berfanbarê li Cizîr'ê hat kuştin. Berdevkên partiyê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku ew piştî pevçûnên şeş saetan domandî hat kuştin ku tê de malên endamên partiyê rastî êrîşên çekdar hatin, û beriyê jî wan rayedar agahdar kiribûn ku bikevin navberê. Wan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku polîsan çi tişt nekirine heya sibetira rojê ku leşker daketine kolana ku endamên Hüda Par'ê dijîn, û di heman demê de cihê ku Abdullah Denîz gule xwaribû. Li gor nûnerên Hüda Par'ê ji ber êrîşên domdar nekarîne wî bibin nexweşxaneyê. Laşê wî şeş saet piştî êrîşxwarinê hat wergirtin. Rayedaran anîn ziman ku ji ber xendekên ku çalakgeran kolabû nekarîne xwe bigihînin cihê bûyerê. Hüda Par hebûna xendekan dipejirîne lê astengbûna wan a ji bo ewlehiya taxê ya ji rayedaran re bi awayekî mafdar rexne dike. Hüda Par'ê alîgirên PKK'ê, ku di nav de Tevgera Welatparêz û Şoreşker a Ciwanan (YDG-H) heye, bi êrîşa li ser alîgirên Hüda Par'ê û bi kuştina Abdullah Deniz sûcdar dikin.

Lê Sêrt'ê, 9'ê Cotmehê, **Kamil Taş** (25) û **Şakir Çal** (39) dema ku navbera çalakgeran û xudanê îstasyoneke petrolê ya li bajêr nakokî çêbû, rastî êrîşa çekî hatin (li lêpirsînên rûpela 14). Malbata Kamil Taş ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku mirovên li qada bûyerê çend caran telefonî polîs û ambûlansê kirine wextê ku ew li cihê bûyerê wek birîndar erdê bûye, lê ew nehatine. Malbata wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku ew bi qasî 45 deqeyan wek birîndar li erdê ma beriya ku xelkê xwe gihandê û ew bi erebeyeke taybet birin nexweşxanê. Şakir Çal du hefte şûnde encama birînên xwe li nexweşxanê jiyana xwe dest da.

Şahidan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku 7'ê Cotmehê li navçeya Misircê ya Sêrt'ê endamên malbata şaredar û parastvanên taybet li sê bûyerên cihê bi çekan danê rojê êrîşî çalakvanên Kobanê kirin, bêyî astengiya polîsan.[10] Bi roj protestoyên girseyî pêk hatibûn ku di wan çalakiyan de erebeyên girêdayî şaredariyê (şaredariya Partiya Edalet û Pêşdeçûnê, an ku partiya hikumetê) hatibûn sotin û dikanên ku xwediyê wan ji malbata şaredar bûn rastî êrîşan hatibûn. Li gor hevpeyvînberan, tengejeya li bajêr piştî bûyera yekem zêde bû, dema ku protestoyek têkildarî Kobanê nava rojê qewimî, kevir avêtin avahiya şaredariyê, cam şikandin, û parastvanên taybet ên şaredar bi teqandina çekan çalakvan bi dûr xistin. Bûyera duyem a di saet 1'ê piştî nîvro de li taxa bazarê ya bajêr pêk hat bi vîdeoyê hat qeydkirin. Di qeydan de tê dîtin ku hejmarek mirovên biçek li bazara tijî însan gule diberdin hewa, her ku polîs bêtevger disekinin.[11] Şexsek bi navê **Cüneyt Yılmaz** (27), di êrîşê de bi çeka agirbar birîndar dibe. Cüneyt Yılmaz ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wî dît kesên ji malbata şaredar çekan diteqînin lê nezanî bê ka kîjanî ew birîndar kir. Piştî gulebarandina wan çi tişt ji bo girtina wan mirovan nehat kirin. Bûyera sêyem li derûdora 5'ê piştî nîvro pêk hat. Şahidan çend endamên ji malbata şaredar ên komeke bi deh kesan nas kirin ku gule diberdan. Li gor şahidan wê koma çekdar bi çekan êrîşî komeke 30 kesan kir, ku bêçek bûn û li dûratiyeke 15 mîtroyan disekinîn. **Mehdi Erdoğan** (30), **Necmettin Çelik** (35) û kurê wî

[10]Hevpeyvînên li Sêrt'ê, Cotmeha 2014'an

[11]Siirttenöte, Şaredarê Misirc'ê Di Nav Êrîşkeran De Ye, Polîs û Leşker Bi Tenê Êrîşê Temaşe Dikin, 17 Cotmeh 2014. Di http://www.siirttenote.com/2014/10/17/kurtalan-belediye-baskani-saldiriyor-polis-ve-asker-izliyor/ dikare bê dîtin.

**Yusuf Çelik** (17) di encama birînên çekan mirin. Li gor qeydên fermî cenderme derbarê vê bûyerê hat agahdarkirin û 45 deqîqe piştî êrîşan gihîşt cihê bûyerê, qalikên fîşekan kom kirin û nimûneyên xwîna rijiyayî wergirtin. Pûşpera 2015'an dozgeran li dijî 10 kesên beşdarî gulebarandinê bûbûn doz vekir û dozname li benda pejirandina dadgehê ma.[12]

Li Dîlok'ê, 9'ê Cotmehê, pevçûnên tund navbera çalakgerên Kobanê yên Kurd û komên neteweperstên Tirk qewimîn, ên ku dirûşmeyên wek "Allahu ekber" [Xwedê mezin e] diavêtin û ev yek jî her wekî nîşaneyeke piştevaniya bi êrîşên DÎ yên ser Kobanê hatin dîtin. Pevçûnên li taxên ku piranî Kurd bûn pêk hatin, û di encamê de ji her du aliyan û ji rêwiyên derbas dibûn kuştî û birîndar çêbûn (beşa lêkolînan, li jêr rûpel 14). Berdevkên Partiya Demokratîk a Herêman (DBP), ku partiyeke siyasî ya çepgir a Kurdan e, ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku du avahiyên wan ên li bajêr ji aliyê êrîşkarên neteweperestên Tirk ve hatin şewitandin. Dema ku Rêxistina Efûya Navnetewîavahiya partiyê ya li herêma Şehit Kamil li Cotmeha 2014'an ziyaret kir, avahî bûbû rejû û hemî tiştên hundir di encama sotînê rûxiyabûn, wek nîşaneya êrîşa çekdarî di kepenkan de qulên guleyan hebûn ku li gor daxuyaniyên endamên partiyê êrîşkar ketibûn hundirê avahiyê.[13] Berdevkên partiyê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku girseyeke dijminane li derve berhev bû û di saet 19.00 de dest bi êrîşa avahiyê kirin û saet 19.30 jî avahî dan ber êgir. Di gel ku wan dema komê êrîş da destpêkirin agahî da polîsan, li gor daxuyaniyên berdevkên partiyê heya saet 10'ê êvarê qet polîsek jî nehat ta ku avahî bi timamî şewitî.

Aşkera tê dîtin ku, bûyerên Kobanê û pevçûnên di wan bûyeran de ji bo kontrola hêzên qanûnî rewşên pir dijwar derxistin holê, eger ku mirov asta tundiyê, beşdarbûna zêde ya nav bûyeran û leza belavbûna wan a li hin navçeyan û ber bi herêman bide ber çavan. Rayedaran, bi şikleke fêmbar, anîn ziman ku ew ji bo bûyerên wiha mezin hem amade nebûn û hem jî xwedî potansîyel nebûn ku li hember tundiyeke di wê astê de bisekinin. Di hin bûyeran de jî hinceta polîsan a ku tevlîbûna wan ê bûyer zêdetir bikirana û hêj bêtir tundî derxista dibe maqûl xwiya bike. Dîsa jî, ew rewş têkçûna polîsan a têkildarbûnê mafdar dernaxîne, ku di hin bûyeran de di gel hawara alîkariyê ya takekes û koman peywîra ewlekariyê ya dihat hêvîkirin pêk nehatiye. Her wisa di hin bûyeran de ewlekarî ewqas têkçûye ku mirina çalakger an jî ya gelên niştecih hema bûye tişteke çarenîn. Di rewşên wiha de hêzên ji bo ewlekariyê xizmetê dikin xwedî peywîr in û divê xwestek û şiyana têkildarbûnê bi wan re hebe. Di ser de jî, di nav avahiyên ku rastî êrîşan hatin de ewlekariya buroyên Partiya Edalet û Pêşketinê (Ak Parti) ji hêla polîsan ve hatine teqezkirin, lê ewlehiya avahiyên partiya siyasî ya Kurdan û avahiyên saziyên muxalîf ji hêza polîsan ve hatiye paşguhkirin. Kêmasiya parastinê rîska kuştin û birîndariyên dema êrîşan zêde kiriye, û bi bikaranîna hêzê ya ji bo hewldanên xwe parastinê an jî êrîşên ji bo tolhildanê jî kuştin û birîndarbûnên dîtir çêbûne. Pêwîstiyeke lezgîn bi lêkolîna operasyonên ewlekariyê heye ji bo ku şiyana wan a parastina takekesan bê dîtin, ders jê bên derxistin, pîlansazî bên çêkirin û di pêvçûnên tund ên pêşerojê de bên bikaranîn.

---

[12]Hevpeyvîn 24 Pûşper 2015

[13]Serdana Rêxistina Efûya Navnetewîya Dîlok'ê ya Cotmeha 2014'an

# 3. BIKARANÎNA POLÎS A HÊZ Û ÇEKAN

Her çiqas kontrolkirina xwepêşandanan peywîrek zor û tevlihev e, û dibe pêwîst bike ku hêzên bicihanîna qanûnê ji bo peywîra dewletê ya dabînkirina rêkûpêkiya gelemperî, ewlekarî û pêşîlêgirtina sûcan bînin cih heya radeyekê hêzê bi kar bînin, dîsa jî di pêkanîna karên xwe de divê ew li gor binbariyên dewletê yên li gor qanûna navnetewî tevbigerin.

Pîvanên bikaranîna qanûnê yên navnetewî aşkera dest nîşan dikin ku hêza ji aliyê polîs bê bikaranîn divê awarte be û divê li gor binbariyên mafê mirovan ên dewletê yên navnetewî be, bi taybetî jî binbariya rûmetgirtin û parastina mafê jiyanê, hebûna fîzîkî û ewlehiya takekesî.[14] Di bicihanîna peywîra xwe de, divê ew beriya ku hêzê bi kar bînin hindî ji dest hat serî li rêbazên bê-tundî bidin. Eger ku sedemên zorlêker hebin, her wekî parastina ewlehiya gelemper an jî pêşîlêgirtina sûcên bitundî, hîngê divê polîs qesta bikaranîna hêzê bikin. Hêzbikaranîn ancax divê bi şertê ku teqez pêwîst be û di radeya maqûl de pêk bê.

Şert û mercên ku hêz û çek ji hêla polîsan ve bên bikaranîn bi şikleke aşkera di Rêgezên Eslî yên Welatên Yekbûyî xala Bikaranîna Hêz û Çekan a ji hêla Karmendên Bicihanîna Qanûnê de (UN Basic Principles on the Use of Force and Firearms by Law Enforcement Officials–BPUFF) hatine destnîşankirin. Rêgeza 14'a dinivîse ku: "Di belavkirina kombûnên tund de, karmendên bicihanîna qanûnê eger ku rêbazên kêmtir xetere bi kêr neyên û ancax bi radeya kêmtirîn dikarin çekan bi kar bînin. Karmendên bicihanîna qanûnê ji bilî rewşên ku di Rêgeza 9'an de hatine kifşekirin ê nekaribin çekên agirbar bi kar bînin." (wekî mînak dema ku ji bo pêşîlêgirtina xetereya mirinê an jî birîndarbûneke xeternak ji bilê wê çareyeke dîtir tunebe).

Eger ku bikaranîna hêzê çarenîn be, BPUFF pêwîst dibîne ku polîs divê di bikaranîna wê de bisînor tevbigere û bala xwe bide armanca bikaranîna wê, zerer û birîndarbûnê kêmtir bike, û teqez bike ku piştgirî û alîkariya tibî di demeke kurt de bigihîşe kesên birîndar an jî bandor lê çêbûyî. Polîs divê ferqê bixe navbera takekesên ku têkildarî tundiyê bûne û yên nebûne–çi çalakgerê aştiyane be çi jî rêwî be; hêza ku bi kar tînin divê li dijî kesên ku serê li tundiyê dane be, û divê miqate bin ku kesên beşdarnebûyî ji birîndarbûnê bên parastin. Rêgez di heman demê de dibêje ku divê hikumet teqez bikin ku bikaranîna hêz û çekan a kêfî an jî bineheqî ya ji hêla karmendên bicihanîna qanûnê bi qanûna netewî wek sûc bê cezakirin.[15]

Dema pevçûnên tund ên protestoyên ji ber rewşa Kobanê pêkhatî, çalakger û dij-çalakgeran serê li tundiyê dan ku tê de çekên agirbar jî hebûn ku ji bo jiyan û hebûna kesên din xetereyeke cidî bû. Bi hejmara çalakgerên ku bi xwe çek digerandin û bi kar dianîn bê hizirkirin, wisa diyar e ku di gelek bûyeran de polîsan ji bilî bikaranîna çekan rêyeke alternatîf nedîtin.Dîsa jî, gelek hevpeyvînberan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku di hin bûyeran de polîsan ji bo belavkirina girseyan an jî ji bo parastina milkên gelemperî çek bi kar anîn, di

---

[14]Madeya 3 ya Qanûna Welatên Yekbûyî ya derbarê karmendên bicihanîna hêzê: "Karmendên bicihanîna hêzê tenê pir pêwîst bike hêzê bi kar tînin û bi asta ku têra bikaranîna peywîra wan bike".

[15]Madeya 7 a Rêgezên Eslî yên Welatên Yekbûyî yên derbarê Bikaranîna Hêz û Çekan a ji hêla Karmendên Bicihanîna Qanûnê.

gel ku çi xetereya jiyanê an jî birîndarbûna bixetere tune bû.[16] Şert û mercên ku di gelek bûyeran de rêya bikaranîna çekên agirbar vekirin, ji ber kêmasiya lêpirsîna rayedaran a bûyerên ku polîs bi xebitandina hêz û çekan a kêfî tên tawanbarkirin, hîna jî ne diyar in, her çiqas nêzikî salek wext di ser bûyerên Kobanê derbas bûbe jî (lêpirsîn, rûpel 14). Di gelek bûyerên li jêr hatine belgekirin de, palpiştên xurt hene ku polîsan hêza zêde an jî nepêwîst bi kar aniye.

Tawanbariyeke bikaranîna çek a kêfî ya ji hêla polîsan ku ji Rêxistina Efûya Navnetewî re hat gotin, bikaranîna cebilxaneya rast bû ku 8'ê Cotmehê li qadeke navendî ya Sêrt'ê ji bo belavkirina komeke 2000 kesên aştiyane berhev bûbûn pêk hat ku hêj daxuyaniya çapemeniyê jî nedabûn. Hevpeyvînberan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku pevçûna bi polîsan re hema piştî vê yekê qewimî.[17]

Şaredariya Cizîr'ê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku Rêbendana 2015'an polîsan agir berda gerîdeyeke wan a kolandinê, (reng e ku bi hinceta ajokar ê xendekê bikole da ku polîsan asteng bike) û guleyên wan li gerîdeyê ket lê ajokar birîndar nebû.[18]

Endamên malbata Taş ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku mala wan a Dîlok'ê bi zanebûn ji hêla polîsan ve hat gulebarankirin. Li gor agahiyên malbatê, 9'ê Cotmeha 2014'an derûdora 11'ê şevê ew li avahiya xwe ya taxa Güzelvadiyê bûn. Pevçûnên navbera çalakgerên Kobanê û neteweperstên Tirk li ciheke nêzik pêk dihatin. Polîsên çalakiyan û gerîdeyên çeka avê li qadeke teng a jêra avahiya wan bi cih bûbûn. Li gor agahiyên malbatê, dema bûyerê li malê 14 kes hebûn. Ji bergeha ku polîs lê bicihbûyî mala wan hatibû gulebarankirin, hema ji wê qada li jêr mala wan. Bi qasî heşt deqeyan gulebaranê domand û malbatê piştre yên ku pace şikandî jî tê de tevahî 16 qulên guleyan dîtin. Qulên guleyan dema ku Cotmeha 2014'an Rêxistina Efûya Navnetewîbi malbatê re hevpeyvîn çêkir bi aşkera dihatin dîtin. Malbatê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wan telefon ji jimareya polîsan a acîl re vekiriye lê polîs nehatiye da ku lêpirsînê bike. Piştî bûyerê malbatê serîlêdana lêpirsîna dadî kiriye lê ne polîs û ne jî dozgerek hatiye ji bo lêpirsînê. Endamên malbatê piştî vê bi daxwaznameyê û bi fotografên zerera li malê ketî serê li polîs daye. Heya dawiya meha Gulanê jî wan hêj agahiyek an jî lêpirsînek derbarê gulebaranê wernegirtibû.

**Hakan Buksur** 7'ê Cotmeha 2014'an derûdora 12.30'ê nîvroyê li qada çalakiyên Kobanê yên li navçeya Varto'yê ya bajarê Mûş'ê ji serê xwe gule xwar û bi vê birînê jî jiyana xwe ji dest da. Parêzerê malbata wan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku Hakan Buksur beşdarî çalakiyan bûbû lê kevir neavêtibû, bi tundî tevnegeriyabû û wî çaxa ku ji avahiyekê derketibû kolana ku polîsan çalakger belav kiribûn gule xwaribû. Parêzerê wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku di lêpirsînê de çi pêşveçûn tune û ew dawiya meha Gulanê ye ku hêj ji şeş şahidên ku wî peyde kirine yek jî venexwendine ji bo îfadeya cem dozger. Wextê ku wî dosye meha Gulanê dîtibû hema tê de rapora polîsan hebû ku digot birîndarî ji kevirên ku avêtine polîsan çêbûye û kişandinên kamerayê jî tê de tune bû. Qet îfadeya polîsekî jî ji hêla dozger ve nehatibû hilgirtin beriya ku biryara veşartinê li ser dozê bê wergirtin û bi vî awayî jî gehîna parêzer a bi

[16]hevpeyvînên li gel şahidên li Cizîr, Dîlok û Sêrt'ê Cotmeh 2014 û Reşemî 2015

[17]hevpeyvînên li gel şahidên li Sêrt'ê Cotmeh 2014

[18]hevpeyvînên li gel şaredariya Cizîr'ê, Reşemî 2015

hûrgiliyên bûyerê asteng bû.

Li Cizîr'ê navbera Berfanbara 2014'an û Rêbendana 2015'an di encama bikaranîna çekên agirbar şeş kuştî çebûn. Ji wan bûyeran di pêncan de, polîs şikberên gule avêtinê ne, (lêpirsînan, rûpel 14). Bi tenê derbarê yek lêdanê de hin zelalî hene. **Nihat Kazanhan**'ê dwanzdeh salî 14'ê Rêbendana 2015'an bi yek guleya ji serê xwe jiyana xwe ji dest da. Daxuyaniyên rayedaran ên destpêkê berpirsiyariya polîsan a agirberdanê qebûl nedikirin.[19] Lê kamerayên polîsan ên ku agirberdan nîşan didan piştre ji hêla rojnamevanan hat bidestxistin û qeyda vîdeoyê di bernameyên nûçeyê yên televîzyonên netewî de hat nîşandan.[20] Kişandin bi şikleke aşkera nîşan dide ku Nihat Kazanhan li gel hin zarokên din li qadeke biçûk ê çîmen ku nêzikî mala wî ye disekine. Vîdeo nîşan dide ku komeke biçûk a zarokan kevir diavêjin her ku gerîdeyeke gaza bîberê nêzikî wan sekiniye. Her ku Nihat Kazanhan dike ku bireve, dengê berdana guleyekê tê bihîstin û ew dikeve erdê, piştre wî dixin nav erebeyekê û dibin nexweşxaneya Cizîr'ê ya dewletê. Vîdeoyeke din a heman dîmenê nîşan dide ku sê polîs li ber gerîdeya xwe ya zirxî sekinîne û yek ji wan gule berdide ber bi zarokan. Cihê ku gerîdeya zirxî sekinîbû ji hêla Rêxistina Efûya Navnetewîve hat ziyaretkirin û hat dîtin ku 50 mîtro dûrî cihê zarokan bûn û nêzikî binkeyeke polîsan jî bû. Bavê Nihat Kazanhan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wî piranî bi zarokên din re li wê qadê dileyîst û dema ku ji nexweşxaneyê gazî kirinê hîngê haya wî bi mirina kurê wî çêbû. Sedema terikandina polîsan a binkeyê, xebitandina gerîdeya zirxî û avêtina gaza bîberê û guleyên rastî ya ber bi zarokan nayê zanîn. Îfadeya pênc polîsên ku li cem gerîdeya zirxî bûn ji hêla dozger ve hat hilgirtin. Doza wan 7'ê Gulana 2015'an li Cizîr'ê vebû. Rûniştina duyem di 2'yê Tîrmeha 2015'an pêk hat.

Di bûyerên Kobanêde bikarîna hêza kujer a ji hêla polîsan ve fikarên cidî derdixe holê ku têkildarbûna polîsan qanûn û pîvanên mafên mirovan ên navnetewî bin pê kirine, mafê jiyanê jî tê de.

Rêxistina Efûya Navnetewîfikara xwe derbarê guherînên qanûnê, yên ji hêla Parlementoyê 27'ê Adar'ê hatin çêkirin û rayeya polîsan a bikaranîna hêzê berfireh dike, jî anî ziman ku wek hinceta wan guherînan bûyerên Kobanê dihatin nîşandan.[21]Qanûn, a ku beşeke “paketa ewlehiya hundirîn e”, rayeyên aşkera dide polîsan da ku li rewşên wek “kes an jî kom bi rêya kokteylên Molotofê, bi teqemenî, navgînên birîndarkirinê… an jî çekên mîna wan êrîşî polîs bikin an jî qesta êrîşa polîs an jî kesên din, êrîşa kargeh, dikan, avahiyên gelemperî, dibistan, wargehê xwendekaran, cihên ibadetê bikin” bikarin çek bi kar bînin.

Di pêşniyarên guherînên qanûnan de, hikumetê rêgeza binîspetiyê ya di qanûna heyî de wek têgeheke “razber” nirxand, ku polîsan di bikaranîna çekan de dixe nav dudiliyê. Ev hikm ji ber ku di hemî mercên ku takekes an jî kom “çekên birîndarker” dişixulînin de, bêyî

---

[19] Daxuyaniya serok wezîr Davutoğlu li ser Nihat Kazanhan Cizîr'ê hatibû kuştin, di http://www.dailymotion.com/video/x2erx9v_davutoglu-ndan-cizre-de-oldurulen-nihat-kazanhan-aciklamasi_news berdest e.

[20] Binêrin li vîdeoyê https://www.youtube.com/watch?v=S1uWNHILeh0

[21] Rêxistina Efûya Navnetewî, Reformên zalimane hêzên berfireh didin polîs da ku muxalefetê tepeser bike, 27 March 2015, di https://www.amnesty.org/en/latest/news/2015/03/turkey-gives-police-broad-powers-to-repress-dissent berdest e.

dîqetkirina rêgezên pêwîstî û nisbetê, mafê bikaranîna çek dide polîsan, lewma li dijî UN BPUFF'ê ye.

# 4. LÊPIRSÎNA MIRIN Û BIRÎNDARIYAN

Bargiriyên Tirkiyê yên mafên mirovan tenê pêşîlêgirtina binpêkirina mafê jiyanê nagire nav xwe, lê di heman demê de lêpirsîneke kêrhatî ya kuştinan jî pêwîst dike ku ji ber bikaranîna hêzê ya çi ji hêla karmendên dewletê çi jî kesên sêyem pêk hatine.[22] Armanca bingehîn a lêpirsînê teqezkirina bicihanîna qanûnê ye ku mafê jiyanê diparêze û teqezkirina berpirsiyarbûnê ye ku berpirsiyariya sazî û dezgehên dewletê jî digire nav xwe.[23]

Hevpeyvînê Rêxistina Efûya Navnetewîya bi xizmên qurbaniyên tundiyê, bi endamên malbatê û parêzeran astengiyên cidî yên li hember bidestxistina edaletê derxistin holê. Bi dehan salên ku sûcdaran ceza wernegirt, yên ku sûcdarên wan xebatkarên dewletê û ne yên dewletê, baweriyeke gerdûnî li holê hişt ku sûcdar ê ceza nexwin. Qurbanî û eqrebayên wan gelek caran bêdil in ku wan dozan bişopînin ji ber ku çi hêviya serketinê bi wan re tune, her ku şahidên tundiyan gelek caran îfadeyê nadin dozgeran, bi tirsa ku îfadeyên wan ên bihûrgilî dê ji wan re bibe hinceta dozê an jî wan bike armanca êrîşa sûcdaran.

Heta di dozên ku qurbanî û malbatên wan bi xwe îfadeyan didin jî, bi qasî salek şûnde tê dîtin ku di ronîkirina êrîşên bisûc de pêşdeçûneke pir kêm pêk hatiye. Di dozên din de, di gel palpiştên xurt, ne şikber hatine şopandin ne jî ji hêla rayedaran ve doz hatine vekirin. Rêxistina Efûya Navnetewîbi tenê sê doz kifşe kiriye ku lêpirsîn bi pêş de çûne û doz hatine vekirin. Yek ji wan doza çar alîgirên Hüda Par'ê yên ku li Amed'ê hatin kuştin e, ku wê bûyerê li qada netewî eleqe dît û ji hêla Serokomar û Serok Wezîr ve hat qalkirin.[24] Yeke din jî doza kuştina Nihat Kazanhan'ê dwanzdeh salî ye (beşa bikaranîna polîs a hêzê, rûpel 10), ku wê bûyerê piştî ku kişandinên agirberdana polîsan ji hêla medya netewî hat bidestxistin û bi awayekî berfireh hat weşandin eleqeya raya giştî kişand. Doza sêyem guleberdana kujdêrî ya ser çalakgerên Misircê (Kurtalan) ên bajarê Sêrt'ê ye (beşa parastina gel, rûpel 7).

Rêxistina Efûya Navnetewî li Dîlok'ê bi çar malbatan re derbarê birîndariyên li qadên protestoyê yên bajêr hevpeyvîn çêkir. **Musa Bayram** (26) li bûyerên pey şewitandina avahiya DBP'ê ya navçeya ŞehitKamil'ê ya 9'ê Cotmeha 2014'an ji hêla neteweperestên Tirk, piştî ku di qada protestoyê de ji serê xwe gule xwar jiyana xwe ji dest da. Malbata wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku di saet 11'ê şevê de li kolaneke kêlekê ya nêzikî avahiya partiyê gule li serê wî ketibû. Şahidan got ku polîsan guleyên rast bi kar anîn li dijî girseya ku şewitandina awahiyê protesto dikir û kevir diavêtin polîsan.Li gor agahiyên parêzerekî ku malbatê temsîl dike, dawiya meha Gulanê jî hêj nehatibû kifşekirin bê ka gule ji çeka polîsekî

---

[22] Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa'yê , Kılıç v Turkey, jimareya serîlêdanê. 22492/93, biryara 28 Adar 2000 xal.78

[23] Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa'yê, Anguelova v Bulgaria, jimareya serîlêdanê. 38361/97, biryara 13 Pûşper 2002

[24] Kovara Cîhanê, ji Erdoğan bibîrxistina 'Yasin Börü', 5 Pûşper 2015
http://www.dunyabulteni.net/gunun-haberleri/331830/erdogandan-yasin-boru-hatirlatmasi

hatibû avêtin, ne jî rayedarên polîsan lîsteya polîsên ku li cihê bûyerê bûn dabû dozger.

Di lêpirsînên derbarê bûyerên heman rojê de jî pêşdeçûneke biçûk pêk hatiye. **A.Ö.**’ya dwanzdeh salî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wê di saet 9.30’ê 9’ê Cotmeha 2014’a de gule xwar, li taxa Beybahçe’ya nêzikî mala wan, nêzikî avahiya partiya DBP’ li cihê ku navbera çalakgerên Kobanê yên Kurd û dij-çalakgeran pevçûn pêk dihatin.[25] A.Ö ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wê qîrîneke Allahuekber (Xwedê mezin e) bihîst beriya gule lê bikeve û wê dît ku gule ji aliyê ku polîs û dij-çalakger (ên ku, li gor agahiyên çalakgerên Kurd, ji hêla polîsan ve dihatin parastin) lê sekinîbûn hat. Malbata wê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re di dawiya Gulana 2015’an de got ku wan hêj ku dawiya Gulana 2015’an e çi agahiyên lêpirsînê heya wê demê wernegirtiye.

S.S.’a nozdeh salî û bavê wê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku ew di heman pevçûnên li taxa Beybahçe’yê yên 9’ê Cotmehê birîndar bûye. **S.S.**’ê li derûdora 6.30’ê êvarê piştî ku ji mala xwe ya li taxê derketibû da ku here qada protestoyê gule xwaribûn. Wê ji singa xwe û pişta xwe çar gule xwaribûn û ji piştê jêr ve felcê lê dabû. Dema hevpeyvînê ya neh roj piştre, di pey pênc rojên tedawiya sext re ew hêj li nexweşxanê bû.[26] Heya Gulana 2015’an jî malbatê çi agahî derbarê lêpirsîna ku kiryarê(n) berpirsiyarê birîndarbûna wê derxîne holê ne girtibû, lê dozeke di çarçobeya qanûna dijî terorîzmê, li ser esasê ku S.S. beşdarî protestoyan bûye li hember wê hat vekirin û dê Îlona 2015’an rûniştina yekem pêk were.[27] Dozeke sivîl a dijî polîsan a ji bo birîndarkirina wê ji hêla rayedaran bi hinceta ku darizandina wê didomîne hat redkirin.[28]

**A.G.**’yê bîst û çar salî heman rojê saet derûdora 8.30’ê êvarê li taxa Vatan’ê ya bajêr bi yek gule û heft saçmeyan hat birîndarkirin. Wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wî du komên dijber û polîs dîtine lê nezaniye ka gule ji kîjan aliyê ve hatin. Ew di tedawiya sext de maye û sê emeliyat derbas kirine, ku di emeliyatekê de gurçikeke wî hilgirtine. Ew heya hefteya yekem a Mijdara 2014’an li nexweşxaneyê razaye.[29] Wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku polîsan îfadeya wî wergirtine û jê re gotine ku ew ê derbarê lêpirsînê wî agahdar bikin. Wî ji ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku ev dawiya meha Gulanê ye ku wî çi agahdarî ji polîsan wernegirtiye û ji bela birînên xwe nikare bixebite. Wî ji bo lêçûnên nexweşxanê berdêleke pere hilgirtiye lê ji bo jidestçûna qezenca xwe tiştek hilnegirtiye.[30]

Şeş meh piştî guleberdanên li Cizîr’a Şirnex’ê ku tê de şeş kes mirin, derbarê bûyerên ku kuştî tê de çêbûn kêm zelalbûn heye, ji bilî doza Nihat Kazanhan (bikaranîna polîsan a çekan, rûpel 10). Di wan pênc bûyeran de qet yekê jî berpirsiyar nehatine darizandin.

---

[25] hevpeyvîn, 20 Cotmeh 2014

[26] hevpeyvîna 21 Cotmeh 2014

[27] hevpeyvîna telefonê ya bi bav û parêzerê S.S re, 24 Pûşper 2015

[28] hevpeyvîna telefonê ya bi bavê S.S re, Pûşper 2015

[29] hevpeyvîn bi A.G. 21 Cotmeh 2014

[30] hevpeyvîna telefonê ya bi A.G. 24 Pûşper 2015

Lêpirsînek têkildarî çar mirinên navbera şeva 26'ê Berfanbarê ta 28'ê Berfanbar'a 2014'an tê rêvebirin, ew bûyera li taxa Nur a bajêr ku pevçûnên çekdarî navbera du komên dijber ên polîtîk qewimîn. Biryara veşartîbûnê ya derbarê lêpirsîna wê bûyerê ku çar kes tê de mirin nahêle parêzerên ku malbatê temsîl dikin xwe bigihînin belgeyên lêpirsînê û bûyerê bişopînin. Di yek wan kuştinan de, **Abdullah Deniz** (65), bavê rayedarê Hüda Par'a Cizîr'ê, li derveyê mala xwe rastî êrîşa guleyê hatibû, ku wê gavê ew şeş saet bûn pevçûnan didomand (parastina takekesan, rûpel 7). Rayedarên Hüda Par'ê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku wî xwe bi çek diparast dema ku li wî dan. Li gor rayedarên Hüda Par'ê ji dema ku îfadeyên malbatê hilgirtine û wir ve çi pêşveçûn pêk nehatiye. Di gulekirina **Barış Dalmış** (16), **Yasin Özer** (21) û **Zeki Alar** (32) de şahid dibêjin ku her sê jî ji hêla polîsan ve hatin lêdan, lê ji roja bûyerê û wir ve çi kes derneketiye pêşberî dozger ji bo îfadedayînê û ne jî keseke din hatiye vexwendin. Rayedaran anîn ziman ku qeydên vîdeoyê yên wan bûyeran ê polîsan bêsûs derxîne. Dîsa jî li gor parêzeran, li pey wan guleberdanan, çi kişandin an jî qeydên deng ên radyoyên polîsan pêşkêşî dozger nekirine, ne jî îfadeyên polîsan hatine hilgirtin. Ümit Kurt'ê şanzdeh salî 6'ê Rêbendana 2015'an li taxa Cudiya Cizîr'ê hat gulekirin û kuştin. Piştî nîvro, piştî hevkirineke bi navbeynkariya şaredariyê, xendekên ku hatibûn kolandin tijî kirin. Li gor raporên polîsan, polîs saet 5.30'ê piştî ku agahî wergirt ku kesên sûretên xwe girtî li taxê trafîk dane sekinandin û belavokan belav dikin ket nav taxê. Şahid dibêjin ku gule hatin avêtin, elektrîk hat birîn û tevahiya taxê di nav tariyê de ma. Li gor qeydên polîsan, gerîdeyên zirxî ketine nav taxê û hatine gulebarandin û wan jî bi guleyên rast ji gerîdeyên zirxî gule berdane, û dest nîşan dikin ku kişandinên kamerayê yên di gerîdeyeke wan de ji bela sedemên nayî zanîn nehatine bidestxistin, û ew dane karmendên teknîkê da ku wê çêbikin. Heya niha rayedarên polîsan bi tenê yek deqîqe kişandinên ji vê kamerayê radestî dozger kirine. Karmendên bicihanîna qanûnê dibêjin ku li gor qeydên kamerayê dema Ümit Kurt gule xwar di destê wî de çek hebû, lê ev yek ji hêla malbata wî ve tê redkirin. Guleya ku ew kuştiye hêj nehatiye kifşekirin, lê rastiya ku polîs çek bi kar aniye nayê redkirin. Malbata Ümit Kurt ji Efûye Navnetewî re got ku dema polîs ket nav taxê, ew ji avahiyeke ku wê rojê boyaxkarî dikir derdiket. Rapora polîsan dibêje ku wan li nexweşxaneya ku piştî birîndarbûnê ew birinê li kincên Ümit Kurt nihêrîne û radyoyeke bêtêl dîtine (dibe ku palpişta danûstandina wî ya bi koma ku şerê polîsan dikir be), lê malbata wî derew derdixîne ku cem wî radyoyeke bêtêl tunebûye. Di dawiya Gulana 2015'an lêpirsînê didomand.

Di bûyera Misirca Sêrt'ê de, ku sê mirov hatibûn kuştin û dwanzdeh jî birîndar bûbûn (beşa derbarê parastina takekesan, rûpel 7), doznameyek dijî 10 kesên têkildarî guleberdanê hat vekirin û heya Pûşpera 2015'an jî li benda pejirandinê bû.[31] Di bûyera kuştina **Kamil Taş** (25) û **Şakir Çal** (39) de, her du kesên ku encama nîqaşa navbera xudanên îstasyona petrolê ya bajarê Sêrt'ê û çalakgerên Kobanê gule xwaribûn (beşa kêmasiya parastina takekesan, rûpel 7), li dijî kiryaran çi lêpirsîn pêk nehat. Li gor şahidan, piştî bûyerê, hêzên ewlekariyê hatin cihê bûyerê û bi gerîdeyên xwe yên zirxî parastina erebeya xudanê îstasyona petrolê kirin. Li gor îfadeya xudanê îstasyona petrolê, ê ku di qeydan de wek qurbanî derbas dibe, wî ji bo parastina xwe çek bi kar aniye. Xudanê îstasyona petrolê got ku çi kamerayên li îstasyonê dema bûyerê nedixebitîn. Reşemiya 2015'an dema ku Rêxistina Efûya Navnetewî şûnde çû Sêrt'ê, dît ku îstasyona petrolê girtî bû û ji hêla polîsên nav gerîdeya zirxî ve dihat parastin.

[31] Li gor agahiyên Komeleya Mafê Mirovan şaxa Sêrt'ê, 24 Pûşper 2015

# 5. ENCAM Û PÊŞNIYAR

## ENCAM

Protestoyên Kobanê û tundiya pê re şertûmercên wisa derxistin pêş rayedaran ku kîjan dewlet bûba jî dê jê re dijwar ba. Berteka rayedarên Tirk ên di wan hemî herêman de, ji bargiriya parastina takekesan û bikarneanîna hêza zêde bigire, ta anîna xirabkariyan a pêş edaletê û dabînkirina berpirsiyariyê, bi kêmasî ye.

Sedemeke qismî ya ewqas xirabkariyê û astengiyên li pêş berpirsiyarî wergirtinê rastiya bi dehan salan e ku sûcdarên ku mafên mirovan bin pê kirine bê ceza mane, û vê yekê jî baweriya bi edaletê kêm kiriye û rê daye ku tundî bêyî kontrol bidomîne.

Bersiva rayedaran a ji dema protestoyan wir ve jî ewqas nebaş bûye, ku bi guherandinên "paketa ewlehiya hundirîn" hêj zêdetir otorîte dane polîsan da ku çek bi kar bînin, ku dê rêya bikarîna hêza kêfî û sûcdar veke û ihtîmala xirabiyan zêdetir bike.

Pêwîstiyeke lezgîn bi jiholêrakirina kêmasiyên ne tenê dema protestoyan çêbûn bes yên bi salan li herêmê berdest in hene û lazim e polîtîkayên ku mafên mirovan pêşde bibin pêk bên, ne ku wan hêj xirabtir bikin.

## PÊŞNIYARÊN JI RAYEDARÊN TIRK RE

### KONTROLKIRINA XWEPÊŞANDANAN

- Lêpirsîneke serbixwe û gelemper saz bike derbarê potesto û pevçûnên têkildarî Kobanê, ku bikare derheqê îdarekirina xwepêşandan a li gor mafê mirovan û derheqê pîvanên wêdetir ên ji bo daxistina tengejeyan pêşniyaran li rayedarên bike, ku tê de saziyên bicihanîna qanûnê jî hebin;

- Teqez bike ku karmendên bicihanîna qanûnê timî li gor qanûnên navnetewî yên mafê mirovan û pîvanên îdarî tevbigerin, bi taybetî jî li gor Qanûna Têkildarî Karmendên Bicihanîna Qanûnê û Rêgezên Eslî yên Welatên Yekbûyî yên derbarê Bikaranîna Hêz û Çekan a ji hêla Karmendên Bicihanîna Qanûnê. Bi taybetî jî, divê ew ji mafên jiyan, azadî, ewlehiya şexsî û hebûna fîzîkî re siyanetê bigirin, wan biparêzin û dabîn bikin;

- Saziyên bicihanîna hêzê û karmend divê bi komên ku haziriya xwepêşandanan dikin re bikevin nav danûstandinê, vê yekê beriyê û dema kombûnê bikin da ku şertên daxistina tansîyonê çêbikin û rûberîhevbûnên nepêwîst ên navbera karmendên bicihanîna qanûnê û çalakgeran çênebin, û rêyên pêşîlêgirtina tundiyê peyde bikin;

- Ji bo avahiyên partiyên siyasî, komele û wargehên din ên ku dibe bibin qada arîşeyan, parastina bitêrê dabîn bike.

## BIKARANÎNA HÊZ Û ÇEKAN

- Eger peywendiya kombûnekê bi tundiyê hebe û eger bikaranîna hêzê çarenîn be, wek mînak ji bo parastina xwe, parastina beşdar an jî rêwiyan a hember tundiyê, karmendên bicihanîna hêzê divê kêmtirîn asta hêzê bi kar bînin da ku bi têra îdarekirina rewşê bike û divê li gor Rêgezên Eslî yên Welatên Yekbûyî be;

- Divê saziyên bikaranîna qanûnê û polîs bi derfetên bitêrê bên piştgirîkirin da ku bikarin çalakî û dij-çalakiyên tund kontrol bikin û di bikaranîna hêz û çekan de perwerdehiyeke baş bibînin. Karmendên bicihanîna qanûnê divê teqez bikin ku kesekî di encama bikaranîna hêzê de birîndar bûbe ji dest xwe re alîkarî û tedawiya tibî wergire, û divê ew bûyerê ji fermandarên xwe re ragihînin;

- Guhertinên nav "paketa ewlehiya hundirîn" divê betal bike ku rayeyên zêdetir didin karmendên bicihanîna hêzê da ku çekan bi kar bînin. Teqez bike ku bikaranîna hêzê û çekan yek û yek li pîvanên navnetewî yên mafên mirovan bê, û bi tenê dema ku pir pêwîst be bê bikaranîn, û ew jî di asteke bitêrê de.

## BERPIRSIYARÎ

- Teqez bike ku lêpirsînên kartêker di hemî mirinan de hatibin çêkirin ku dibe ji ber bikaranîna hêzê pêk hatibin û teqez bike ku kiryar derkevin pêş edaletê;

- Lêpirsînên lezgîn û bêteref di hemî bûyerên bikaranîna hêza nepêwîst û zêde ya ji hêla karmendên bicihanîna qanûnê yên dema bûyerên Kobanê bide çêkirin, û bi şikleke rêkûpêk, prosedûrên sûc û dîsîplînê li hember berpirsiyaran bide xebitandinê;

- Karmendên bicihanîna qanûnê yên ku di bin lêpirsîna êşkence û kirinên nebaş de ne divê ji karê çalak bên ragirtin hindî ku pêvajo didomîne;

- Bêyî derengî komîsyoneke şikayetên derbarê polîsan ava bike da ku lêpirsîna xirabiyên ku karmendên bicihanîna qanûnê kirine bike, û gavên pêwîst bavêje da ku teqez bike ku hevkariya nêzik a navbera dozgerî û polîs a di mijarên giştî de nehêle bêterefiya wan a di wan meseleyan de ji holê rabe;

- Teqez bike ku qurbaniyên binpêkirina mafên mirovan ên ji hêla karmendên bicihanîna qanûnê mexdûr bûne, bikarin xwe bigihînin tedawiyeke bikêr, telafiyên guncav bi dest bixin, ku tê de tezmînat, rehabîlîtasyon, tetmînkarî û garantiya dubarenebûnê hebe.

AMNESTY INTERNATIONAL

amnesty.org